NAWISK

ÇAXÊ SITEM LI TÊKISTÊ WÊJEYÎ DIHÊTE KIRIN

Tehsîn Naviskî

Heger mirov nirîneka hûr li mijarên li ser rûpelên rojname û kovarên li herêma Kurdistana başûr bike, wê ji me ra aşkere bibe rêjeya wî xwandevanê me yê bi hûrî têkistê dixûne, roj bo rojê li kêmê dide, girovê vê gotinê jî, lawaziya mijarên rexneyî yên afirandî û çêj zanistî yên li ser singên weşanên me yên berdewam dihêne çapkirin.

Sererayî mezinbûna (piroblema) xwandevanê rexneyî, dê hind bînî wêjevanekî li vir û yekê li wir di çavpêkevtinên xwe yên rojnamevanî de, ragehand; me filane tuxmê wêjeyî nîne. Yan heger me hebe jî ne bi wê rêjeyêye ku nasnameya riyalistê kurmancî werbigre. Bi nirîna min hilsengandina têkistê wêjeyî dihête weşandin bê xwandina naveroka wî yan bê xwandineka kûr, cûn e bê wijdaniyeke li wî têkistî dihête kirin; heger nebêjin şitem û xiyanet a dîrokê ne!.

Gereke her xwandevanekê bivê têkistî helsengîne, wî têkistî li pê nirîneka zanistî bi xûne û layenên hevdij û erênî bi mejiyekî vekirî destnîşn bike, paşî dûrî haviliyên ke-

sokî û dilsoziya nêzîkbûnê, bila têkistekê din yê afirandî li ser têkistê ketiye jêr tîrêjkên rexneyê ava bike.

Bi nirîna min rewşa rexneya me ya bi vî şêwazî, dê her pêvajoya rewşenbîriya me ya wêjeyî hêlte li dawiya xelkekê din.

Em hemû dizanin em ji layê tiyor û piraktîzên layenên rexneyî ve çend lawaz in, nemeze ji layê rexneya wêjeyî ve. Evca niho bo me geleka giring e em xwe ji vê giriftariyê rizgar bikin. Bi dilekî baqij li berhemên hevdu yên wêjeyî bikin xwedan û bi mêkenîzmeka zanistî û dûrî xweperêsiyê û nêrgiziyê mijarên wêjevan û nivîserên xwe dahînane hilsengînin.Çunke eger rexnevan bi niyazeka rast destpêşxeriyê neke û ranebe bi erkê xwe yê dîrokî û verêjên nivîserên me bi şêweyekî ekadîmî ne helsengîne û ji gelên din re aşkere neke me jî nivîskar û rewîenbîrên xwedan hizir û aşopên afirandinane hene, kesê nayê ji me re we bike.